

Sûriya û Bahoza Azadiyê!

Rozad Elî

Dihat gotin, ku gelên Ereb li derveyî demê û dîrokê mane, lê roja îro li ber çava ye, çawa tevgerên guhertinê li gelek dewletên Ereb radibin, di encamê de sazûmanên dewletan ji binî ve tîn rûxandin, û gel azadiya siyasî bi serfirazî werdigirin.

Ne tenê wilo, ew tevgerên dîrokî û guhêrbar roj bi roj ferehtir dibin û bandorên têvel û mezin li gelek dewletên din jî dikin û gelên Rojhilata Navîn hişyar dikin.

Çima na!? Eger em bala xwe bidinê, emê bibînin pîrsgirêkên piraniya dewletên Rojhilata Navîn mîna hev in, mîna ku destlatdar û serokên wan tif devên hev kiribin, ew wek hev difikirin, mîna hev zordariyan dikin qîmetê nadin daxwaz û pêdviyên gelên xwe, her roj û her katê rûmeta mirovên xwe bînpê dikin, û ji hev bêtir jî sermiyanên serzemîn û binzemîna welatên xwe didizin.

Ev tiştên paşverû û setembar ku me li jor gotine, ji salixên sazûman û destlatên piraniya dewletên herêma Rjhilata Navîn in, û digel ku genîbûna wan êşkere bûye û bêhna wan derketiye, lê hema qelewîzên xweguhertineke rast jî li ba sazûmanekê serî hîlnadin.

Di nava ev bahoza guhertinan de, sazûmana Sûryê jî dê hêmen nemîne. Ji ber ku ew jî ji aliyê gendeleyê û perçiqandina rûmet û mafê mirovan de ji destlatên kevin û navdar e. Çiqas berpîrsên destlatê bixwazin rûyekî pak bidin destlata xwe, û rastiyan destlata xwe ya zordar jî veşêrin, carina sond jî bixwin ku

rewşên giştî li Sûryê aram û gulvedayî ne, lê ew hîç nikanin royê bi bêjingê bigrin û rastiyan sazûmana xwe ya paşverû û destgiran bincil bikin.

Ji berê ve dibêjin "Rum di tûran de netên veşartin", wek tê zanîn, hemî çavkanî û çavdêrên pîspor li der û hundurê Sûryê, mêlag dikin ku rewşa gelê Sûrî ji her aliyekî ve bi aloz û dijwarî bûye. Zanînen rastgo diyar dikin jî ku, dora %40 ji gelê Sûryê daketiye bin asta sêfliyê, ew jî rastiyeke mezin e, tirsdariyeke giran di hundurê xwe de hildigre û zemîneke lêhatî û îjdir ji bo tevgerên cemawerî yê rikber re peyda dikin.

Dîsa zanîn diyar dikin jî, ku rewşa qada civakê ya naverast, ku ji xudî şihadeyên zanîngehan, hejmara mezin ji karmendên dewletê, bazirgan û pîşeyên biçûk û naverast pêk tê, ew jî digazin, rewşa wan jî ne durust e, ew jî dibin metirsîyeke îjdir de ne û li ser jiyana malbatên xwe û paşeroja xwe bi tirs in, ji bilî ku haya wan ji guhertinên ku li dunyayê dibin heye, û çavên wan bi miştî û bi dilxawziyeke mezin li azadî, demokresî û bilindkirina rûmeta mirova ye.

Ji bilî ku nofeke fereh ji qada birciwaziya dewlemend û xwedî sermiyanên mezin, ewa ku rûmeta xwe diparêze û derbas nava pîsîfî û gendeleya destlatê nebûye, ew jî ji tinebûna azadî û demokrasîyê nezrazî ne û ji kiryarên destlat û siyasetên wê yê tevahî ne fehesî ne, û ta radeke bilind li ser paşeroja sermiyanên xwe bi tirs in. **D.R(11)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yê di girtîgehên Sûryê de